



Desthilat û Erk

Tevahiya bernameyên bajêr ku di asteke taybet da têkildarî kesên koçberbûyî ne, bo Konseya Şêwirîna Entegrasyon û Welatîyên Biyanî tên raberkirin. Ev konse danezaneke çêwirînê raberî şaredar û Konseya bajêr dike. Konseya Şêwirîna Entegrasyon û Welatîyên Biyanî dikare nûnerekî bibijêre ku li Konseya Bajêr xwedan mafê bihîstin û axaftinê di mijarên têkildarî koçberan e.

Erk:

- Em berjwendiyên tevahiya koçberan li bajarê Dresdenê nûnertî dikin.
- Em dixwazin pişk û rola xwe di baştirkirina jiyana koçberan bi cih bînin.
- Em piştgiriya didin pêkvejiyana bi hevgerîtinê ya kesên ayîdî hemî neteweyan li Dresdenê.
- Em piştgiriya didin pêşketina hemî kesan li Dresdenê, bêyî berçavgirtina netewe (regez), kok û esl, dîn û ayîdbûna etnîkî.
- Em karê peywendiya gelemperî ji bo dabînkirina berjwendiyên koçberan pêk tînin. Em piştgiriya didin mafê beşariya di hîlbijartina navçeyî ji bo koçberan, nemaze ji bo welatîyên welatên sêyem.
- Em piştgiriya didin hevkarîya li jine, komên pêngavrakirinê û sazîyên hikûmî ku mijarên têkildarî entegrasyona koçberan cîbecî dikin.
- Em piştgiriya didin lihevneziyên welatîyên Dresdenê ku nû koçber bûne û welatîyên ku ev demeke dirêj e pêkva li vir dijîn.
- Em xwe wek berpirsîyarê bersivdana bo hemî wan kesan dizanin ku pirs an xwestekine wan hene ku têkildarî entegrasyon an koçberiyê ne.

Yekemayetên karî:

Konseya Şêwirîna Entegrasyon û Welatîyên Biyanî gellek mijarên ku têkildarî koçberên niştecihê Dresdenê ne, hildikolîne.

Nemaze babetên xwarê digire ber xwe:

1. Nûnertiya berjwendiyên siyasî ji bo jinavbirina cihêkariyê û tevgeriyana yeksan digel kesên bi raborioya koçberiyê
2. Bicîhkirina li gorî şan û cîgeha kesan û beşdariya civakî ya penaxwazan
3. Baştirkirina qabiliyeta dîtinê û desthilatên Konseya Şêwirîna Entegrasyon û Welatîyên Biyanî, her wiha xebata pêkanîna tor û şebekeyê di asta eyaletî û federal da
4. Parastina berjwendiyên xwendevan, xwendekar û zanyarên derveyî
5. Hevkarî û piştewaniya ji li jine, yekîtî û sazîyên Koçberiyê
6. Piştewaniya ji hînbûna zimanê zikmakî û rewacdana hînkariya zimanê zikmakî û pirzimanîbûnê
7. Piştewaniya ji jiyana çandî û civakî ya civatan
8. Navçîtiya navbera ofîs, rêveberî, welatîyên xwedan raboriya koçberiyê an bêyî wê

Tu jî xwedan pişk par di pêkhatina wê da yî!

Beşdariya Siyasî ya ezmûnkirî li Dresdenê

- Konseya Şêwirîna Entegrasyon û Welatîyên Biyanî ya bajarê Dresdenê wek navenda eyalettê Komîteyeye Siyasî li Eyaleta Sachsen'ê ye koçber wê didijêrin û dikarin ji bo wê bibin berbîjêr. Wek nûnertiya berjewendiyên siyasî yê bi bîjartî bi rêya qanûnê, yazdeh endamên xwedan raboriya koçberiyê her pênc salan carekê bi awayê demokratîk rasterast ji aliyê koçberên niştecihê Dresdenê va tên bîjartin, neh endamên Konseya Bajêr ji Fraksyonên Konsseya Bajêr in.
- Konseya Şêwirînê bi awayê serbixwe, bêyî destûrkar û bi awayê xwebexş dixebite.
- Civînên me di esas da aşkira û gelemperî ne.
- Civîn dikarin li malpera www.dresden.de/auslaenderbeirat werin dîtin.

Kesên xwedan kursiya Nûnertiye

Endamên xwedan raboriya Koçberiyê yê xwedan mafê dengdanê

Youmna Fouad Anwar Abdelaziz

Alevtina Akimova-Böttner

Salem Al Saad

Konstantin Arkush

Abdulaziz Bachouri

Truong Binh Bui

Dr. Hussein Hasham Jinah

German Levenfus

Dr. Md Shahinur Rahman

Viktor Vincze

Yujie Yao

Endamên xwedan mafê ddengdanê - Fraksyon

Matthias Dietze

Franz-Josef Fischer

Jens Genschmar

Annick Ghaldouni

Mirko Göhler

Julia Hartl

Heiko Müller

Margarita Pushkina

Tina Siebeneicher

Hûrgiliyên weşanger

Weşanger:

Landeshauptstadt Dresden (Bajarê Dresdenê yê navenda eyaletê)

Integrations- und Ausländerbeirat (Konseya Şêwirîna Entegrasyon û Welatîyên Biyanî)

E-Mail: auslaenderbeirat@dresden.de

Malper: www.dresden.de/auslaenderbeirat

Têkiliya digel Rêveberiya Navendî 115 – Em ji pirsan pêşwazî dikin

Belgeyên elektronîkî bi wajoya elektronîkî ya xwedan merc bi rîya formekê dikarin werin raberkirin. Ji bilî vêya, îmkana şifredarkirina emailên şandî bo bajarê Dresdenê yê navenda eyaletê bi gewahiyeye S/MIME an şandina emailên ewleh bi De-Mail'ê heye. Zanyariyên zêdetir li adresa www.dresden.de/kontakt hatine nivîsandin. Ev belge nameya ragihandinê beşek ji xebata Peywendiya Gelemperî ya Bajarê Dresdenê yê navenda Eyaletê ye. Sûdwegirtina wê ji bo propagandaya hîlbijartinê rêpêdayî nîne. Helbet partî dikarin ji bo haydarkirina endamên xwe wê bi kar bînin.